# „NOW! Ne bêyî me“

Asoyên sala 2022´an





# Koma Me

Di xwe temsîlkirina „Now! Ne bêyî me“ de penaberên kêmendam û xizmên penaberên kêmendam tên temsîlkirin.

Xwe temsîlkirina me yekta ye! Di komê de kesên xwedî berjewendiyên cihêreng, kesayetiyên balkêş û jêhatî-bûna herî cihêreng hene.

Em vekirî, bi deng, xwedî armanc, xwedî biryara xwe û femînîst in.

Handicap International bi me re di rê de ye. Armanca me ya hevpar baştir tevlîbûn û beşdarbûna penaberên kêmendam e.

Em li benda gavên xwe yên pêşerojê ne!

# Em dixwazin di Sala 2022´an de çi bikin



Me di salên 2020 û 2021´an de gelek destkeftî bi dest xistin. Ji bo sala 2022´an jî me planên mezin danîne ber xwe: Em dixwazin koma xwe xurtir bikin, xwe hîn zêdetir temsîl bikin û hîn zêdetir zanînê ava bikin.

Em dixwazin bi sê gavan bigihêjin armanca xwe.



1

# Bi hevre bûn, pevguhertin û fêrbûn

Weke berê, em mehê carekê li hev dicivin, ji bo ku emtorên têkiliyê ava bikin,

- tiştên girîng nîqaş bikin û
- çalakiyan plan bikin.

Di van çend mehên dawî de me kursên perwerdeyê li ser mijarên ku bi taybetî ji bo me girîng in, li dar xistin. Handicap International di sala 2022´an de li ser van mijaran kursên perwerdehiyê yên din organîze dike. Bi vî awayî em hîn bêtir zanînê ava dikin. Wek mînak li ser van pirsan:

- Çi mafên penaberên kêmendam hene?
- Em, siyaset û rayedaran çawa dikarin beşdariya penaberên kêmendam bi dest bixin?

**Koma „Now! Ne bêyî me“ wê di sala 2022´an de jî ya herî girîng bimîne. Ew, wekî tê gotin, hundirê xwe temsîlkirina me û hêza me ye.**

- Penaberên kêmendam ji bo beşdariya serketî hewceyê çi şert û mercan in?
- Ez çawa dikarim serpêhatiya xwe, ezmûn û jêhatîbûna xwe ji bo xwe û penaberên din ên kêmendam baş bikar bînim?
- Çi min bi hêz dike?
- Ez çawa xwe wekî kesek bêhempa xurt bikim?

Kursên perwedehî dê hevdîtinên me temam bikin. Ji bo pevguhertina me dê gelek wext hebe. Her weha em dê hevdû baştir nas bikin.

## Her meh programek

Di destpêka mehê de Handicap International ji me re peyamek dişîne: ya bi navê perspektîfa mehane. Di wê de, ew, roj û mijarên civîna bê ji me re diyar dikin. Di peyamê de, em dikarin her weha bibînin ka wê mehê bêtir çalakî tên encamdan.

## Endamên nû ji bo komê

Çiqas hejmara endamên kome me zêdetir be, kom ew qas zindîtir dibe. Ji ber vê yekê em penaberên din ên kêmendam û xizmên wan di derbarê xebata xwe de, bi qasî ku mimkûn e, agahdar dikin. Em dixwazin ku ew tevlî „Now! Ne bêyî me“ bibin

Di çêkirina reklamê de ji bo koma me Handicap International piştgirî dide me.

.

2

# Xwe temsîlkirin di siyaset û rêveberiyê de

Niha Almanya berjewendî û pêdiviyên penaberên kêmendam bi têra xwe li ber çavan nagire. Gelek caran ne siyaset, ne qanûn, ne rêveberî û ne jî navendên şêwirmendiyê şert û mercên beşdarbûna serketî ya penaberên kêmendam nizanin!

Em ji xwe dipirsin:

> Em çawa dikarin zextê li siyasetmedar û rayedaran bikin ku di pêşerojê de berjewendî û pêdiviyên me li ber çavan bigirin?

Bersiva me ev e:

> Di sala 2022'an de emê bi wezaret û rayedarên girîng re biaxivin û rewşa xwe ji wan re **bibêjin**.

Emê wusa bikin:

> Em çîroka jiyana xwe ji kesên li wezaretan û rayedaran re vedibêjin. Her weha em ji wan re behsa ezmûn û zehmetiyên xwe yên bi sîstema alîkariya Almanî re **dikin**. Em rewşa jiyana xwe û jiyana xwe ya rojane ji wan re **vedibêjin**.

Emê **van pirsan bikin,**

- yên ku ji me re girîn in û
- yên ku heta niha kesî bersiva wan nedaye me.

**Saziyên Alîkariya ji bo kêmendaman û Alîkariya ji bo penaberan têra xwe baş bi hev re naxebitin! Ji ber vê yekê jî penaberên kêmendam bi gelemperî nagehîjin xizmetgûzariyên girîng ên beşdarbûnê.**

Em astengên ku li pêşiya gihîştina me ya piştgirî û jiyanê li Almanyayê radiwestin, **rave bikin**.

Di hevdîtinan de em nûnerên hemû penaberên kêmendam in.

## Rola Handicap International

Handicap International di projeya me de piştgirî dide me: Komele bi kesên girîng ên wezaret û rayedaran re nîqaşên parastî pêk tîne. Ev rê dide me ku em bikaribin fikarên xwe yên herî girîng diyar bikin, mînak, gihîştina

- Alîkariyên civakî,
- Kar û pîşe,
- Kursên ziman,
- Tevlîbûna civakî û beşdarbûnê.

Piştî axaftinan, em bi Handicap International re raya giştî ji encaman agahdar dikin.

Wekî din, Handicap International hîn bêtir rêxistinên ku dixwazin piştgiriyê bidin me, seferber dike. Em bi hev re daxwaz ji siyaset û rêvebirinê dikin ku mafên me biparêzin û berjewendî û pêdiviyên me tamîn bikin.

Empowerment Now!

# Fêrbûn ji xwe temsîlkirinên din

3

Me gelek caran ji xwe pirsî:

Em dixwazin wekî kom çawa pêş bikevin?

Em dizanin:

Em dixwazin di pêşerojê bi awayek serkeftî ji bo berjewendî û mafên hewil bidin û hertim di asta erkên xwe de bin.

Ev pirs ji bo me girîng in:

- Bi kîjan çalakiyan em xwe nîşanê siyaset, rêveberî û civakê bidin?
- Em çawa dikarin ji hêla penaberên kêmendam ve bên naskirin?
- Em çawa dikarin berjewendî û ramanên cihêreng ên endamên xwe di koma xwe de baş bînin cem hev?
- Em çawa dikarin her tiştî organîze bikin daku em bi qasî ku mimkûn e, baş bigihîjin armanca xwe?

# Raman û bersivên mimkûn ji bo komê

Li Almanyayê ji bo kesên pir cûda xwe temsîlkirin heye, hinek ji wan demeke dirêj e ku çalak in.

Her weha ji bo penaber û kesên kêmendam jî xwe temsîlkirin hene. Em dikarin ji wan şîretan bistînin û ew jî bersiva pirsên me didin. Handicap International li vir jî alîkariya me dike. Komele de di sala 2022´an de mînakên baş ên xwe temsîlkirinê li Almanyayê nîşanî me bide. Hin xwe temsîlkirinan di qada revê de, yên din di qada kêmendamî de dixebitin.

Emê – em bi hêvî ne bi şexsî- bi xwe temsîlkirinên bijartî re hevdîtinan pêk bînin ji bo ku em

- hev nas bikin
- pevbiguherînin, lê her weha
- ji ezmûnên wan fêr bibin.

Dûv re, bi Handicap International re, em difikirin ka em dixwazin çi ji wan tiştan ji bo koma xwe bipejirînin.

Em li benda rêya xwe temsîlkirina xwe ne ji bo beşdarbûn û tevlîbûna penaberên kêmendam li Almanyayê!

# 7 qaîdeyên zêrîn ji bo hevkariya me di sala 2022´an de



1. Em bi rêz û hurmet li hember hev tevdigerin.

2. Soz û peywirên me girêdayî ne, em dikarin xwe bispêrin hev.

3. Hevdîtinên me bi rêkûpêk pêk tên – çi li ser Înternet an jî bi şexsî.

4. Em bi zelalî danûstandinê dikin.

5. Em pevguhertina ezmûnên xwe diparêzin.

6. Di civînên me yên xebatê de mijarên ku me ji berê de diyar kirine, tên rojevê.

7. Em qebûl dikin ku her endamek hewcedariyên xwe hene û ku em hemî hewcedariyên cûda hene.

# Armancên me



- Tevlîbûn û beşdarî di hemî qadên jiyana civakî de
- Bêastengî
- Naskirina maf û dîtina arasteyan
- Bidestxistina agahdariyan li ser pêşniyarên alîkariyê û dîtina şîretan
- Em bibin komek mezintir
- Hevdîtinên bi aliyên peywendîdar: siyaset, rêveberî, karmendên pispor
- Hebûna danûstandina zêdetir û naskirina perspêktîfên bêtir
- Danîna tora têkilî bi komeleyên din re
- Bidestxistin û parvekirina zanîna başdarbûnê, tevlîbûn û hêzê
- Bilindkirina hişyariya giştî li ser berjewendî û hewcedariyên me
- Bi hêzkirina jinan û keçan
- Avakirina piran di navbera me û mirovên li Almanyayê de

Di sala 2022´an de em dixwazin bi hev re xebata xwe bi hêz bidomînin da ku emhemî van armancan bi dest bixin.

# Beşdar bibe!

Tu li gorî me yî û karê me bala te dikşîne? Wê hingê xwe bigehîne me – beşdar bibe!

„Now! Ne bêyî me“

